Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 405 nameronahi@gmail.com 2 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Bi çandina sebzeyan debara xwe dikin



Çandina sebzeyan di dema havînê de, dibe tiştê herî sereke ku gelek welatî debara xwe li ser bikin û bi dehan doniman erd tên çandin. Li kantona Girê Spî gelek welatiyên herêmê li ser çandina sebzeyan debara xwe dikin û hin kes jî di nav erdê ku hatiye çandin de kar dikin. Çandina sebzeyan her sal di meha Nîsanê de dest pê dike, ji ber ku yan bi rengê konên naylon (sera) tê çandin an jî bi rengekî asayî tên çandin. Gelek ji welatiyên herêmê çandiniyê di erdên pir teng de dikin an jî di nava erdê pembo de sebze tên çandin. Di heman demê de welatiyên heremê debara xwe li ser çandina sebzeyan pêk tînin. Her wiha pêdiviyên xwarinê di demên zivistanê de jî di havînê de tên hazirkirin. Lê gelek cureyên hazirkirinê hene; yan tên esirandin an jî tên zuhakirin.
Gelek cotkar çandina sebzeyan ji xwe re nakin armanc lê tenê ji bo debara jiyana xwe tê çandin, ne ji bo firotinê. Cotkarên bi navên Ebûd El-Himêdiş û Qeys El-Emîn da zanîn ku her kesekî xwedî erd be debara jiyana xwe li ser çandiniyê dike û tiştekî sosret e ku cotkar sebzeyan dikirin...*ANHA*

# PERWERDEYA FERMANDARAN DEWAM DIKE





Meclisa Leşkerî ya Minbicê dewreyeke perwerdeyê li Akademiya Şehîd Koçerîn ji 35 fermandaran re da destpêkirin.
Meclisa Leşkerî ya Minbicê bi merasîmekê dewreya perwerdeyê ya 35 fermandaran bi navê Dewreya Şehîd Îbrehîm El-Hisên (Cezar) da destpêkirin. Tê payîn ku dewreya li Akademiya Şehîd Koçerîn hatiye destpêkirin, 45 rojan dewam bike. Di dewreyê de dê dersên leşkerî, fikrî û hunera şer werin dayîn.
Dewre bi beşdarbûna hejmareke fermandar û leşkerên Meclisa Leşkerî ya Minbicê, bi rêzgirtina leşkerî dest pê kir. Paşê endamê Fermandariya Meclisa Leşkerî ya Minbicê Ebû Elî Necim axivî û vekirina dewreyê pîroz kir. Necim got ku hêzên wan dê li dijî hemû dijberên herêmê bibin mertalên parastinê.
Piştî axaftin bi dawî bû, beşdarên dewreyê soza leşkerî dan û dewreyê dest pê kir.
Şehîd Îbrehîm El-Hisên (Cezar) ku dewre li ser navê wî hate vekirin, dema cihê xwe di hemleya rizgarkirina Reqayê de digirt, şehîd bû...
*ANHA*

# EMÊ KOÇERTÎ Û SEWALVANIYÊ BERDIN







Koçerên Sêrtî ku her sal berê xwe didin zozanê Nebirnavê, destnîşan kirin ku ji ber qedexekirina zozanan her diçe heqê kirêya mêrgan zêdetir dibe. Koçeran got, "eger wisa dewam bike em ê ji mecbûrî dev ji koçertiyê û sewalvaniyê berdin."
Koçerên Sêrtî, îsal jî berê xwe dan zozanê Nebirnavê ku di navbera Colemêrg-Wanê de ye. Koçeran bal kişand ser qedexekirina zozanan û destnîşan kirin ku eger wisa dewam bike ew ê ji mecbûrî dev ji sewalvaniyê berdin. Her wiha koçeran bilêv kir ku zozanên neqedexekirî jî, heqê kirêya wan zêde ye.
Koçer Abdûllah Şenyuz, diyar kir ku ew ji meha Gulanê ve berê xwe didin zozana Nebirnavê û got: "Hem ji ber sarbûna hewayê hem jî şertên herêmê gelekî zehmet in. Li herêma me havînê carinan germahî dibe 50 pile jî. Lê ev zozan pir hênik in û berdar in. Heywanên ku em xweyî dikin, li ber germê îdare nakin. Eger heywanên me li wan deran bimînin dê bimirin."
Şenyuz, diyar kir ku ji ber polîtîkayên siyasî, leşkerî û aborî yên li herêmê tên sepandin, hema bêje sewalvanî qediyaye û got: "Îsal sed col pez ji herêma Sêrtê hat. Berê du qat zêdetirî vê dihatin. Tiştê dizanim ji herêma me bi sedan col hatine Nebirnav, Fereşîn û Meydana Casûsê. Tenê li herêma Sêrt û Wanê heywan mane. Ji ber ev tengasiyên li pêş sewalavniyê, gel dev ji sewalvaniyê berdide. Ji ber polîtîkayên ti sepandin êdî ciwanên me naxwazin bi me re werin zozanan."
Mehmet Şîrîn Îlbaş jî diyar kir ku ji bo ew werin vê herêmê ew 40 rojî meşiyane û got: "Em 3 mehan li van zozanan dimînin. Dema em tên em 40 rojî dimeşin. Piştî şîrê heywanên me namîne û serma dest pê dike em berê xwe didin herêma Botanê."
Ayşe Şenyuz jî, diyar kir ku ew şîr û mastê xwe jî difiroşin banedarên ku tên zozanan. Şenyuz diyar kir ku ji ber mesrefên zozan û mêrgan û heqê şivanan tiştek di dest wan de namîne.
Hatîce Şenyuz jî diyar kir ku tendûra ku wan sala din çêkiribû texrîb bûye û got: "Niha em jina bi hev re tendûrê çêdikin. Sala çûyîn van wextan me ev tendûr çêkiribû. Lê ji bo pihêtina nan divê em wê ji nû ve biselihînin. Mêr tenê bi karê xweyîkirina heywanan re eleqedar dibin. Karê din jî jin dikin. Em dixebitin, lê mêr dixwin. Karê zozan li ser milê jina ye. Em êzingan berhev dikin. Em tenûrê diselihînin. Em li zarokan dinêrin. Em xwarinê çêdikin."...*MA*




---

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 405 2 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî



**Di êrîşa dewlat Tirk ya li ser başûr de hedef Îran e**
Ezîz KOYLUOGLU *R-4*

# XEZEBA ZEYTÛNÊ LI ÎDLIBÊ LÊ DA




## DI DAGIRKIRINÊ DE XWEDÎ ROL BÛN

Çalakiyên şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê yên li dijî leşker û çeteyên dagirker berdewam dikin. Şervanan li Idlibê ku di bin kontrola dewleta Tirk û çeteyên wê de ye, li dijî koma çeteya bi navê Feyleq El-Şam çalakiyek kir, di encama çalakiyê de 2 çete hatin kuştin. Hat ragihandin du endamên koma çete ku di dagirkirina Efrînê de xwedî rol bûn, hatin kuştin.

## DU ÇETE HATIN KUŞTIN

Têkildarî mijarê Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê ev daxuyanî da, "'Yekîneyên me yên Odeya Çalakiyê ya Xezeba Zeytûnê yên Idlibê, 30'ê Hezîrana 2018'an li dijî nuqteya koma çete ya bi navê Feyleq El-Şam çalakiyek kirin. Yekîneya me nuqteya koma çete rûxand û di encama çalakiyê de du endamên koma çete yên bi navê Elî El Hemûs û Xalid El Faris hatin kuştin. *R-2*

## Çalakiya Zîlanê rê li ber pêvajoyeke nû vekir

Gêrîlayên jin 22 salvegera çalakiya Zîlanê nirxandin û diyar kirin ku vê çalakiyê rê l ber pêvajoyeke tekoşînê ya nû vekiriye. Gerîlayan got, "Hevrê Zîlan bi çalakiya xwe ya mezin bersiveke mezin da êrîş û siyaseta qirkirinê ya li ser gelê Kurd û Rêber Apo." *R-3*

## Dewleta Tirk li Başûrê Kurdistanê jinek kuşt

Êrîşên dewleta Tirk yên li ser başûrê Kurdistanê bê navber berdewam dikin. Ji ber van êrîşan herî zêde mirovên sivîl zerarê dibînin. Di encama topbarana dewleta Tirk a dagirker ya li ser herêma Berzan de jineke 19 salî jiyana xwe ji dest da. *R-3*

## JIN TV heyecaneke mezin ava kir




Jin TV roja 30'yê Hezîranê dest bi weşana xwe ya normal kir. Destpêkirina weşana Jin TV di serî de jinên Kurd hemû jinên cîhanê de heyecaneke mezin ava kir. Jinên Dêrsimê diyar kirin vebûna Jin TV ji bo wan xwedî weateyeke mezin e û gotin, "jin wê bi awayekî rihet xwe îfade bikin û bînin ziman." *R-3*

## Em ê xeyalên Şêx Seîd pêk bînin




### ZAROKÊN WAN WÊ XWEDÎ LI WAN DERKEVIN

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê, Şêx Seîd û 49 hevalên wî yên 93 sal beriya niha li Amedê ji aliyê dewleta Tirk ve hatin îdamkirin bi bîr anî û diyar kir ku wê xewn û xeyalên wan bi cih bînin. KCK'ê wiha got, "Di salvegera 93'an a darvekirinê de em Şêx Seîd û 49 hevalên wî bi minetdarî û rêzdarî bi bîr tînin. Kurdistana Azad xewn û xeyala Şêx Seîd û hevalên wî bû. Gelê Kurd gelekî deyndarê wan e. Zarokên wan jî wê bibin xwedî sekna wan a bi rûmet.

### EW PÊŞIYÊN BI RÛMET YÊN KURDAN IN

Şêx Seîd û hevalên wî, li dijî polîtîkayên mêtinger qirker bûn wijdan, exlaq, hesret û temsîla Kurdan. Eger ew wê wextê li ber mêtingeriya qirker ranebûna, ew berdêl nedabûna, wê têkoşîna azadî û demokrasiyê derneketibûya holê. Kêmasiyên xwe yên rêxistinî û rêbertî çi dibe bila bibe, ji aliyê dîrokî ve xwedî roleke bi vî rengî ya mezin bûn. Hezar carî heq kirine ku bibin pêşiyên bi rûmet ên Kurdan. *R-4*

## Em ê Efrînê rizgar bikin, dagirkeriyê têk bibin





Meş û çalakiyên gelê Efrînê yê li Şehbayê li dijî dagirkeriya dewleta Tirk bê navber berdewam dike. Bi hezaran welatiyên Efrîn û Şehbayê li dijî dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê meşek girseyî lidarxistin. Di meşa ku veguherî mîtîngê de hat gotin ku wê Efrîn rizgar bibe û dagirkerî têk biçe. *R-5*

## Divê destûra Sûriyê li gor daxwazên gel be



Hevserokê MSD`ê yê buroya Helebê Merei Şiblî diyar kir ku divê destûra bingehîn ya Sûriyê mafê hemû pêkhateyan bide. Şiblî wiha got, "Civînên mîna Cinêv û Astana negihîştin tu encamê û tiştek nedan gelên Sûriyê. Pêdiviya gelê Sûriyê bi destûreke ku hemû maf û azadiyan misoger bike, heye." *R-4*

## Binpêkirin li Efrînê di asta jor de ne




Komîseriya Bilind a Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî derbarê rewşa mafên mirovan li Sûriyê de raporek weşand. Di raporê bal hat kişand ser binpêkirinên mafên mirovan ên di meha Hezîranê de li bakurê Sûrî û bi taybetî li Efrînê pêk hatiye û got, "binpêkirin di asta herî jor de ne." *R-5*

## Dagirkeran zêdeyî 100 sivîl revandin



Kiryarên hovanê yên artêşa tirk a dagirker û çeteyên wî li di jî gelê Efrînê bê navber didome. Piştî teqînên dawî ku li navenda bajêr rû dabûn, hêzên dagirker zêdeyî 100 welatî revandin. Hin kes piştî ku 1500 dolar ji malbatên wan stendin ew serberst berdan. Li hember kiryarên dagirkeran gelê Efrîn daketin qadan. *R-2*

## Li dijî çeteyên nepenî operasyon hat kirin




Meclîsa Leşkerî ya Dêra Zorê, li dijî çeteyên DAÎŞ'ê yên nepenî operasyonek pêk anî. Di operasyonê de gelek çete hatin bêbandorkirin. Meclîsa Leşkerî diyar kir ku operasyon bi serkeftî encam bûye û da zanîn çeteyên hatine destgîrkirin jî wê radestî saziyên darazê bên kirin. *R-2*

## HPG'ê lê da: 13 leşker hatin kuştin

Çalakiyên gêrîlayan yên li bakurê Kurdistanê li dijî artêşa tirk a dagirker bê navber berdewam dikin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir, li navçeya Gever a Colemêrgê di çalakiyên gerîla de 12 leşkerên Tirk hatin kuştin. Li Wanê jî di çalakiya YJA Starê de leşkerek hate kuştin. *R-2*

# Şervanan li Îdlibê li çeteyan xistin

**_Çalakiyên şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê yên li dijî leşker û çeteyên dagirker berdewam dikin. Şervanan li Idlibê li dijî koma çeteya bi navê Feyleq El-Şam çalakiyek kir, di encamê de 2 çete hatin kuştin._**




Şervanên Odeya Çalakiyê ya Xezaba Zeytûnê li Idlibê li dijî koma çeteya bi navê Feyleq El-Şam çalakiyek kir, di encamê de 2 çete hatin kuştin.
Odeya Çalakiyê ya Xezaba Zeytûnê li Idlibê, ku bi kontrola dewleta Tirk û çeteyên wê ye, li dijî koma çete ya bi navê Feyleq El-Şam çalakiyek pêk anî.
Hate gotin du endamên koma çete ku di dagirkirin û talana Efrînê bi ristekê rabûbûn, hatin kuştin.
Odeya Çalakiyê ya Xezaba Zeytûnê wiha ye:
''Yekîneyên me yên Odeya Çalakiyê ya Xezeba Zeytûnê yên Idlibê, bi mebesta ku bersivê bide talan û dagirkirina li Efrînê ya komên çete, 30'ê Hezîrana 2018'an li dijî niqteya kome çete ya bi navê Feyleq El-Şam çalakiyek kirin. Ev koma çete ku li Efrînê di dagirkerî û talanê de bi çalakî bi ristekê rabûbûn, li bajêr li dijî mirovên me yên sivîl tiştên der mirovî kirin.
Yekîneya me bi çalakiya xwe niqteya koma çete bi temamî rûxand, du endamên koma çete yên bi navê Elî El Hemûs û Xalid El Faris kuştin.
Em diyar dikin cihên komên çete ku di dagirkeriya Tirk a Efrînê de bi roleke çalak rabûne û talanê didomînin, li Idlib, Efrîn, Ezaz, Marî, Bab, Cerablûs û Raîyê niqteyên wan em ê tim ji xwe re bikin hedef. Soza ku me dayî di nêz de wê pêk were. Efrîn bi sebre, tolhildan nêzîk e.''

## Li dijî çeteyên nepenî operasyon hat kirin




Meclîsa Leşkerî ya Dêra Zorê, li ser çeteyên DAÎŞ'ê yên nepenî operasyonek pêk anî. Di operasyonê de gelek çete hatin bêbandorkirin.
Di malpera QSD'ê de di derbarê operasyonê de daxuyaniyek hat weşandin. Daxuyanî wiha ye:
"Li Dêrazorê li ser çeteyên DAÎŞ, El-Qaîdeyê û hin derdorên girêdayî rejîmê ku di demên dawî de li bajêr ketine tevgerê dixwazin tevlîhevî û aloziyê derînin, operasyoneke hate pêkanîn. Ev çete beriya niha bi motosîklet û seyareyên bombe barkirî sivîl hedef girtibûn, bibûn sedema şehîdbûna gelek sivîl û şervanan.
Li ser daxwaza gelê bajêr û eşîrên li herêmê bi armanca ku herêm ji çeteyan bê paqijkirin, li gundên girêdayî bajêr operasyon hat destpêkirin. Operasyonek li Mergeda, ya dîtir jî li bajaroka El-Besîra hevdemî hat destpêkirin. Ev operasyona ku di dorhêla agahiyên girîng hatî pêkanîn de gelek çeteyên ku ligel wan seyareyên bombe barkirî, çek û mayin heyî hatine girtin û tevahiya amûrê hatî desteserkirin jî hatiye tunekirin.
Ev operasyona ji hêla Meclîsa Leşkerî ya Dêrazorê ve hatî meşandin, bi serkeftî encam bûye. Çeteyên hatî destgîrkirin jî wê radestî saziyên darazê bên kirin."


## Dagirkeran zêdeyî 100 sivîl revandin



Hate ragihandin ku çete û leşkerên artêşa Tirk a dagirker binpêkirinên xwe yên li dijî sivîlên Efrînê didomînin. Piştî teqînên dawî ku li navenda bajêr rû dabûn, hêzên dagirker operasyonên binçavkirinê da destpêkirin û zêdeyî 100 welatî hatin revandin. Li hemberî binpêkirinan şênî daketin qadan.
Çavkaniyekî ji hindirê girtîngeha dibistanê ji bo jiyana xwe nexwest navê xwe eşkere bike ragihandin ku hejmara kesên hatin revandin û di girtîgehê de ne derket 100 û destnîşan kir ku temenên wan di navbera 18 û 60 salî de, piraniya wan şofêr in, di dema teqîn rûdan, ew jî li cihê teqînê bûn.
Heman çavkaniyî destnîşan kir ku çete û leşkerên artêşa Tirk a dagirker li kesên revandine de her cûre êşkence dikin û hin jî wan piştî ku kêmanî hezar û 500 dolar ji malbatên wan standin ew serbest berdan.Li gorî agahiyên ku çavkaniyan dane, dewriyeyên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê li navenda bajêr û taxa Eşrefiyê zêde bûne û digirin ser malan û bi hêncetên ne di cih de erebeyên wan desteser dikin.
Li hemberî binpêkirinên dagirkeran, şêniyên taxa Eşrefiyê daketin qadan…*ANHA*

## HPG'ê lê da: 13 leşker hatin kuştin

HPG'ê diyar kir, li navçeya Gever a Colemêrgê di çalakiyên gerîla de 12 leşkerên Tirk hatin kuştin. Li Wanê jî di çalakiya YJA Starê de leşkerek hate kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla yên li Colemêrg, Wanê ev agahî da:
"Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de, 28 û 30'ê Hezîranê li gelek herêmên navçeya Gever a Colemêrgê çalakî kirin. Agahiyên berfireh ên li ser çalakiyan;
28'ê Hezîranê saet 19:40'î, li dijî bendeke kontrolê ya dagirkeran a li gundê Şirvanê û girekî ku ewlekariya benda kontrolê bû, çalakiyek hate kirin. Derbên giran li benda kontrolê û çeperên li ser gir ên dijmin hatin xistin û di encamê de 5 leşkerên dijmin hatin kuştin.
Hêzên me 30'ê Hezîranê saet navbera 08:30 û 13:00 li dijî dagirkerên li ser girê Bayê çalakiyên sûîqestê kirin. Di encama çalakiyan de 2 leşkerên dijmin mirin.
29'ê Hezîranê hêzên me li leşkerên li ser girê Deriyê Cefer xistin. Artêşa TC a dagirker piştî çalakiyê li qada Deriyê Xizê dest bi operasyonê kir. Roja 30'ê Hezîranê saet 15:00 li dijî yekîneyeke operasyonê çalakiya sabotajê hate kirin. Bi qasî hate zelalkirin, di çalakiyê de 5 leşker mirin.
Di çarçoveya Pêngava Serketinê ya Şoreşgerî de hêzên me yên YJA Starê roja 29'ê Hezîranê saet 15:40'î, li dijî leşkerên li ser girê li ber qereqola Gulizerkê ya navçeya Ebex a Wanê çalakiya sûîqestê kirin. Di encamê de leşkerekî dijmin mir.



## Îsraîlê tankên xwe yên li ser sînor zêde kir



Artêşa Îsraîlê ragihand ku şerê li Sûriyê giran bûye, lewma wan tank û cebilxaneyên xwe yên li ser sînorê Sûriyê zêde kirine.
Artêşa Îsraîlê diyar kir ku şerê navbera artêşa Sûriyê û komên çekdar giran bûye û ji ber vê yekê wan jî tank û cebilxaneyên xwe yên li ser sînor zêde kirine.
Di daxuyaniya artêşê de hate ragihandin, ku polîtîkaya Îsraîlê ya 'xwevegirtina ji şerê navxweyî yê li Sûriyê' dewam dike.
Artêşê diyar kir, ji ber rewşa li Girên Golanê wan hejmara çek û leşkerên xwe yên li herêmê zêde kirine.



# Helbestvaniya herî girîng dengbêjî ye

**_Helbestvanê Kurd Rênas Jiyan diyar kir ku di çand û hunera Kurdan de helbestê bi çanda dengbêjiyê re dest pê kiriye û got, "Di çanda Kurdan de rola helbestê xwedî li derketina ziman û wêjeya Kurd e. Helbest firehkirina giyanê mirovan e, mezinkirina ruhê xwe ye."_**



Helbestvanê Kurd Rênas Jiyan diyar kir ku di çand û hunera Kurdan de helbestê bi çanda dengbêjiyê re dest pê kiriye û got: "Ji ber agirê helbestê ronahî ye, desthilatdar helbestê ji bo xwe weke gef dibîne."
Helbestvan, helbestên xwe dikin zimanê lihevparkirina hest û ramana civakan. Cîhana xwe bi xwendevanan re parve dikin. Bi gotineke din; helbest cîhana lihevparkirina pêhesîn, hest, xeyal, hizir û ramanê ye. Raste helbest huner e, lê bi qasî hunerbûna xwe, amûra ragihandina hewcedarî ya jiyanê ye jî. Ew wijdana hevpariya civatê ye. Di helbestê de afirandina lihevparkirina hest, xeyal û ramanê heye.

### HELBEST GEŞKIRINA BERXWEDANÊ YE

Helbestvanê Kurd Rênas Jiyan helbest weke azadî, evîndarî û welatparêziyê nirxand û anî ziman ku helbestvanî di heman demê de mirovparêz û ziman parêzî ye. Jiyan li ser rola helbestê di nava çand û hunera Kurdan de got, "Di çanda Kurdan de rola helbestê xwedî li derketina ziman û wêjeya Kurd e. Helbest firehkirina giyanê mirovan e, mezinkirina ruhê xwe ye. Helbest geşkirina berxwedan û doza welat e."

### HELBEST RUHÊ MIN Ê DUYEMÎNE

Jiyan desnîşan kir ku helbest şêwaza wî ya jiyanê ye û wiha pê de çû: "Ez gelek giyanî û jiyanî li helbestê dinêrim. Helbest weke ruhê min ê duyemîn e û şêwaza min a jiyanê ye. Eger ez helbestan nenivîsim ez nikarim bijîm. Dema ku ez helbestan dinivîsim ez xwe azad hîs dikim. Dema ku ez xwe azad hîs dikim û xwendevanên min wê berhemê bixwînin ew jî xwe azad hîs dikin. Dema di helbestê de xwe dilbirîn pêk neyê, ez xwe dernedim di helbestê de, wê demê wê di ruhê min de pirsgirêkên cuda derkevin. Ji ber vê yekê helbest ji bo min giyanî ye."

### XEBATÊN LI SER WÊJEYÊ DIDOME

Jiyan bilêv kir ku hemû berhemên wî weke ya ewilê ji bo wî girîng û bi wate ne û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Dema ez helbestan dinivîsim ez li xwendevanên pêşerojê jî difikirim û helbestan dinivîsim. Ez wêjeya Kurdî hêjayî helbestên baş dibînim û ji bo vê jî hemû helbest ji bo min girîng in. Xebatên min ên li ser wêjeyê herdemê didome û amadekariyên min ên ji bo pirtûkek nû heye."

### DENGBÊJÎ HELBESTVANÎ YE

Helbestvanê Kurd Rênas Jiyan li ser kurte dîroka helbesta Kurdî jî axivî û ev tişt got: "Baba Tahirê Uryan weke destpêka helbesta Kurdî tê dîtin. Ji bo Kurdan ez dikarim dengbêjiyê weke destpêka helbestê bi nav bikim. Helbesta Kurdî ji çanda dengbêjiyê dest pê kiriye. Çiqas dengbêjî weke muzîk û lorandinê bê gotin jî mirov dikare bêje dengbêjî her wiha helbestvanî ye. Li gorî ferqa roja me ya îro dengbêjî nehatiye nivîsandin. Ji xwe çanda dengbêjiyê çand û hunera Kurdan li ser lingan girtiye. Dengbêjî dewlemendiyek çanda Kurdan e. Di nava Kurdan de helbestvaniya herî girîng jî dengbêjî ye."

### KURD LI HELBESTÊ XWEDÎ DERDIKEVIN

Jiyan di çand û hunera Kurdan de asta helbestê nirxand û got: "Kurd ji helbestê hez dikin. Dema ku em li civakên biyanî dinêrin, em dibînin ku êdî qîmetê bi helbestê nadin û helbestê îhmal dikin. Civaka ku daxwaza azadiyê dike û ji bo welatê xwe têdikoşe, daxwaz û xwedîderketina li helbestê jî zêdetire. Helbest û azadî gelekî nêzî hev in û hevalên hev in. Kurdên azadîxwaz li helbestê xwedî derdikevin, ji ber ku helbest hîsên Kurdan vedibêje û Kurd xwe bi helbestê tînin ziman. Li gorî çavdêriyên min têkiliya Kurdan û helbestê baş e."


### AGIRÊ HELBESTÊ RONAHÎ YE

Jiyan anî ziman ku herdemê helbest, helbestavan bûne hedefa desthilatdaran û bi van gotinan dawî li axaftina xwe anî: "Ji ber ku helbest herdemê rastiyê tîne ser ziman û agirekî yê dilêr e ev jî ji bo desthilatdaran xetere ye. Ji ber agirê helbestê ronahî ye û ji ber rastiya helbestê desthilatdar helbestê ji bo xwe weke gef dibîne."…*ANF*

## Li Şêxmeqsûdê pişesazî zindî dibe



Li taxa Şêxmeqsûd a Helebê 71 pîşesazan piştî aramî li taxê pêk hat, kar û xebatên xwe careke din da destpêkirin. Kar û xebatên hatine destpêkirin, bandorê li pêşketina rewşa aborî ya taxên Helebê dike.
Bajarê Helebê wek paytexta aborî ya Sûriyê dihate naskirin. Di encama şerê 8 salan ê Sûriyê de rewşa welatiyên Helebê pir dijwar bû, wêranî û rûxandin li herêmê pêk hat. Hin kesan ji ber şer malbata xwe winda kir, hinan kar û pîşeya xwe winda kirin. Bi taybet bazirgan û kesên xwedî semyan, neçar man her tiştî li pey xwe bihêlin û koçber bibin. Hinan jî qebûl ne kir dest ji karê xwe ku bûye çavkaniya sereke ya jiyana malbata xwe, berde.
Taxa Şêxmeqsûd jî wekî taxên din ên Helebê para xwe ya giran ji şerê heyî dît. Di taxê de gelek febrîqe û kargeh hebûn. Kar û pîşeyên destan jî pir li taxê dihatin meşandin. Lê ji ber şer û pevçûnan xebatên pîşeyî û bazirganiyê li taxê bi paş ketin.



Bi vegera welatiyan re aramî li taxê pêk hat. Niha jî derdora 71 pîşe û karên cada di taxê de têne kirin. Piraniya pîşesaz û hosteyên wan karan ji gelek herêmên Sûriyeyê hatine û karê xwe li Şêxmeqsûdê dimeşînin. Di taxê de 12 pîşeyên berê dihatin kirin, hebûn. Bi derbasbûna van 71 pîşeyan re êdî hejmara giştî ya kar û pîşeyên li taxê têne meşandin bû 83.
Di taxê de gelek kargehên dirûtina cilan hene, ew jî derdora ji sedî 47 ji pîşeyên têne meşandin. Cureyên cuda yên cilan têne dirûtin. Karên din jî necar, kargehên paqijiyê, kargehên madeyên xwarinê, xwarinên zarokan û wekî din. Di taxê de her wiha gelek kargehên vekirina madeyên avakirinê û yên pîl û pêdiviyên ceyranê jî hene. Li aliyê din jî gelek temîrkarên erebeyan jî hene.
Li gorî serjimartinên rayedarên taxê, niha di taxa Şêxmeqsûd de derdora 5 hezar karker dixebitin. Rayedarên Şaredariya Gel a Şêxmeqsûd diyar kir ku pêşketina jiyana welatiyan bi xerca kesan ve girêdayî ye. Xerc jî bi kar û xebatan zêde dibe.
Li aliyê din berhemên herêmî bandorê li buhayên madeyan dikin, ji ber wiha buhayên veguhastinê kêm dibe. Zêdebûna kar û xebatan di heman demê de xwetêrkirinê di gelek aliyên jiyanî de pêk tîne.
Endama Rêveber a Komîteya Peymanan a Şaredariya Gel a Şêxmeqsûd Zeyneb Cernas derbarê mijarê de got ku şaredarî ji bo hêsankirina karê pîşesazan û hostayan hewldanan dike, cihê kar ji wan re peyda dike û ruxseyê dide wan.
Zeyneb Cernas her wiha da zanîn ku beriya niha li taxê hejmareke mezin a dikanan tune bû û wiha dewam kir: "Berê li taxa me dikan zêde nebûn, ev yek jî bû sedema ku buhayên madeyan zêde bibe, lê niha dikandar vegeriyane û vê yekê rê vekir ku buhayên madeyan kêm bibe." Zeyneb di dawiya axaftina xwe de jî bang li hemû karmend û pîşesazan kir ku vegerin taxê û karên xwe bidomînin…
*ANHA*



## Wêjeya Kurdî li Bruksel

Derwêş M. FERHO

Di warê wêjeya Kurdî de di van salên dawîn de xebatên hêja pêk tên. Berhemên giranbiha têne weşandin. Di aliyekî de roman, helbest yan çîrok tên weşandin, di aliyê din de li ser wêjeyê jî kedeke darîçav heye. Li ser vê xebatê di rojên pêş me de dirawestim. Mijara me ya îro ewê bibe "wêjeya Kurdî li Bruksel" ku di Nîsana 2008 de pêk hat. Bi alîkariya Wezareta Kultûrê ya Flaman, kû wê demê Bert Anciaux wezîr bû, Enstituya Kurdî ya Brukselê, saziya Het Beschrijf û kovara wêjeya hemdemî Deusexmachine bi amanca nasandina pirsgirêka Kurdî bi rêya wêjeyê çalakiyeke du hefteyî hate amadekirin. Bi gelek dijwarî û pirsgirêkên ku ji aliyê dewletên dagîrker xistin pêş nivîsakarên vexwendî, ev çalakiya wêjeyî pêk hat. Ji 22 nivîskarên ku hatibûn vexwendin 8 dikarîn werin. Û tev çend nivîskar û rojnamevanên Flaman rojeva xwe domandin.Nivîskarên hêja Konê Reş, Helîm Yusuf, Hêvî Berwarî, Hesen Silêvanî, Xeyrî Bozanî, Îbrahîm Selman, Şahînê Bekirê Soreklî û çend navên din beşdar bûn. Şahînê Bekirê Soreklî wek mêhvanê Enstituya Kurdî li Brukselê û saziya het Beschrijf mehekê mêhvanê nivîsê ma û çend hefte paşê jî Firat Cewerî bû mêhvanê nivîsê. Şahînê Bekirê Soreklî romanek di destê xwe de li vira qedandibû. Di dema koma nivîskarên Kurd li vir bûn û berhemên xwe didan nasandin elaqeteke mezin ji bo wêjeya Kurdî hebû. Şeva taybetî ku ji aliyê peyamnêra bi nav û deng ya Radio-Televîzyano Flamanî Annelies Beckx hate meşandin gelek kes beşdar bûn û raste rê bi nivîskarên Kurd re dan û stendin. Sohbeta wan pirralî bû. Li ser ziman, li ser wêjeyê, li ser dîrokê, li ser pirsgirêka dagîrkeriyê û tesîra van mijaran di wêjeya Kudî de hat axaftin.Di heman demê de jî kovara Deusexmachina hejmareke taybetî (nr 124, 2008) bi wergerên berhemên Kurdî û şeş nivîsên nivîskarên Flaman weşandibû. Di wê hejmarê de helbestên Konê Reş, Şeyhmus Dagtekin, Ferhat Pîrbal, çîrokên Ibrahîm Selman, Hasan Kaya, Helîm Yusuf, Şahînê Bekirê Soreklî û Firat Cewerî bi wêneyên xweş yên hunermend Nick Hannes ji Kurdistan hatibû weşandin. Heta niha jî kesên ku li wê hejmara taybetî dipirsin hene.Di roja dawî de wezîrê kultûrê Bert Anciaux nivîskarên Kurd vexwendin wezaretê û bixêrhatina wan kir. Li ser pêşniyara wî nameyek ji bo Komîserê Çandê yê Ewropa re hat amadekirin û hem nivîskaran hem wezîr îmze kir. Di namê de hêvî û daxwaza piştgiriya mafên kultûrî, ziman û wêje ji bo Kurdan dihat kirin. Ev daxwaz bi taybetî ji hikûmeta Turkiyê dihat kirin. Name hat şandin, lê mixabin bersiv qet nehat. Di roja îro de jî derfetên pêkanîna çalakiyên weha hene. Ev çalakî girîng in û divê pêkwerin. Têkoşîna ku Kurd ji bo jiyaneke bi rûmet bijîn ne bes di aliyê siyasî de ye. Ne jî bes di têkoşîna çekdarî de ye. Bila kes nefikire ku xebata siyasî û têkoşîna çekdarî bê fêde ne. Bêyî xebata siyasî emê negihin ti cî. Û bêyî têkoşîna çekdarî jî kesek hesab ji me nake û emê nebin xwedî qirşikek hişk. Hêza me ya çekdar temîna (garantî) pêşeroja me ye. Şervanên me rûmeta me ne.Lê em ji bîr nekin ku xebat û jiyana bi zimanê Kurdî, xwedîlêderketina kultûr, orf û adedan, sitran û muzîkê, huner û nirxên xwe pêdiviyek e. Bêyî van jî ti wateya siyasî û çekdarî namîne. Her xebateke di çarçeweya neteweyî de xwedî girîngiyeke taybet e.

# Şaredarî xebatên xizmetê didomîne

***Şaredariyên Bakurê Sûriyê xebatên xwe yên xizmetguzariyê didomînin. Li ser giliyên şêniyên navçeya Eyn Îsa ya herêma Firatê ya Bakurê Sûriyê, Şaredariya Gel a navçeyê û bi hevkariya rêveberiya kampê dest bi kolandina depoyên binerd ji bo ava kanalîzyonê kir.***

Şaredariya Gel a Eyn Îsa dest bi kolana depoya ava kanalîzasyonê kir. Bi vê yekê jî dê ziyanên li ser xweza û şêniyan kêm bibin.
Li ser giliyên şêniyên navçeya Eyn Îsa ya herêma Firatê ya Bakurê Sûriyê, Şaredariya Gel a navçeyê û bi hevkariya rêveberiya kampê dest bi kolandina depoyên binerd ji bo ava kanalîzyonê kir. Depo li nêzî kampa navçeyê tê amadekirin.
Armanc ji vê yekê jî ew e ku ava kom dibe, zirarê dike û dibe sedema nexweşiyan û belavbûna bêhna nexweş ji holê rabe.
Depo bi dirêjahiya 25 û firehiya 5 metreyan û kûrbûna 3 metreyan hate çêkirin.
Rayedarên şaredariyê destnîşan kir ku xebatên depoyê dê mehekê dirêj bike.



Ava kanalîzyonê ya kampê kom dibe û ev yek bû sedema pirsgirêkan. Li ser vê yekê rêxistineke tûreyên kanalîzyonê di kampê danî, lê li ser çaresiya ava kom dibû kar nekir. Lewma av li cihekî bi qasî 2 hezar metrekare kom bû.
Welatî ji bêhna wê aciz bûn û di heman demê de bû sedema zêdebûna kêş û mûran di nava civakê de.
Derbarê vê mijarê de endamê Komîteya Fenî ya Şaredariya Navçeya Eyn Îsa Osman Bozan diyar kir ku kolandina depoyê dê çareseriyê ji pirsgirêka avê re peyda bike û destnîşan kir ku ev çareseriyeke demkî ji pirsgirêka kombûna avê re ye. Bozan da zanîn ku şaredariyê cihê depoyê li nêzî cihê kombûna avê diyar dikir û kar niha li ser wî esasî tê meşandin…*ANHA*

## 180 kesan xwe kuştin û hatin kuştin



Li Başûrê Kurdistanê bûyerên kuştin û xwe kuştinan her ku diçe zêde dibe. Li gorî daneyên Desteya Serbixwe ya Mafê Mirovan di şeş mehên dawî de 180 kes yan xwe kuştine yan jî hatine kuştin.
Hema bêje di van rojên dawî de, li Başûrê Kurdistanê her roj kesek tê kuştin yan jî xwe dikuje. Rê li ber bûyeran nayê girtin. Hikûmet jî divê derbarê de alternatîfek nîşan nade. Li gorî rêjeya hatî bi dest xistin, di şeş mehên dawî de 180 kes hatine kuştin yan jî xwe kuştine.
Li gorî rêjeya Desteya Serbixwe ya Mafê Mirovan a li Herêma Kurdistanê ku me bi destxistiye, di nava 6 mehên îsal de, li Herêma Kurdistan 180 kes hatine kuştin yan jî xwe kuştine. Bêguman ev kuştin û xwekuştin ji herdu rêgezan pêktên. Ev rêje ji bilî kuştin û xwekuştinên terorîstane yên li herêmên bi nakokin.
Li gorî yasaya 111 a sala 1969'an a madeya 405 ku li ser gunehbarên kuştinan hatiye nivîsîn, cezayê wan kesan, muebet yan jî 20 sal cezaye. Li gorî madeya 406 ya ku ji bo kuştinên bi mebest tê kirin, cezayê wan kesan darvekirine yan jî muebed e.
Herwiha di yasayê de ceza ji bo wan kesên ku kesekê teşfîqê kuştinê bikin jî heye.
Ew jî li gorî madeya 408 a li Herêma Kurdistanê, dema kesek yê ser temenê 18 salî re teşfîqê xwekuştina kesekê din bike, ew kes herî kêm 7 sal tê girtin. Ger ew kes di bin temenê 18 salî de be û ew kuştin bi mebest be, cezayê darvekirinê tê dayîn, yan jî muebed dixwe.
Li gorî rêjeya Girtîgeha Çaksazî ya Gewran a Silêmaniyê, 243 girtî bi madeya 405 yan jî 406 bi taybet bi gunehbariya kuştinê di nava çaksazi Gewran de hene. Herwiha zêdetirî 129 girtî jî li gorî madeya 408 di girtîgehê dene.
Parêzer Sergul Qeredaxî li ser bûyerên kuştin û xwe kuştinan diyar kir ku rêjeya kuştinê zêde bûye, bi taybet ev rêje li Herêma Kurdistan zêde bûye. Qeredaxî di dewamê de got; "Zêdetir kesên ku tên dadgehê, ji ber sedemê hebûna qeyrana aborî, nebûna çareseriya kar a ji bo ciwanan û rêjeyek mezin jî ya kesên ku zanîngeh xilaskirine. Herwiha hebûna çekên bêruxset jî sedemek mezin yê vê yekê ye. Dema ku kesek bi kesekê re dikeve nava bûyerê, yekser çeka xwe bikartîne û bûyer rû dide. Divê li hember vê yekê ewlehî were girtin."
Parêzer Qeredaxî diyar kir ku cezayê kuştinên bi mebest, li gorî yasayê darvekirine, lê Herêma Kurdistan ev ceza hatiye sekinandin. Qeredaxî diyar kir ku gelek kes li ber efûya giştî jî dikevin tên azad kirin, yan jî cezayê wan tê kêm kirin. Parêzer Qeredax daxwaz kir ku divê ji bo kesên cezayê darvekirinê û muebedê hatî dayîn yasaya efûkirinê derbaz nebe.
Pispora civakê Rojgar Hesen jî li ser çareseriya bûyerên kuştin û xwe kuştinê got; "Divê civak bê hişyar kirin daku bûyerên bi vî awayî rû nedin. Pêwîste kanalên ragihandinê yên rêzefîlmên bûyerên bi vî awayî têde hene bên sansûr kirin. Lazime her malbatek ku zarokên wan înternetê bikartîne agahdar bin û hay ji zarokên xwe hebin. Înternet bi awayekî raste raste bandorek neyênî dike. Rojgar balkişand ser çekên bê ruxset jî û got, "pêwîste bikaranîna çekên bê ruxset were sînordar kirin."…*ROJNEWS*

## Kolanên Sûrê terkî qirêjê hatine kirin

Şaredariya Sûrê ya ku qeyûm tayînî wê hatiye kirin, ev 2 meh in kolanên sûrê paqij nake û ji gelaşê re hiştine. Niştecihên Sûrê bertek nîşanî ve helwesta qeyûm dan û gotin; "Dixwaze kîjan bedelê bime bide dayîn?"
Piştî ku li Tirkiyê rewşa awarte hat îlankirin û şûnde şaredariyên Partiya Herêmên Demokratîk (DBP) ji wezîfê hatin girtin û li şûna şaredarên DBP'ê qeyûm hatin tayînkirin. Ji van şaredariyên ku qeyûm tayînî wan hatin kirin yek jê jî Şaredariya Sûra Amedê ye. Qeyûmê ku di serî de saziyên jinan girtin û jin mexdûr kirin, niha jî kolanên dîrokî yên Sûrê ji gelaşê re hiştine. Welatiyên Sûrê ku ji ber gelaşa li kolanan nema dikarin tevbigerin bertek nîşanî qeyûm dan. Li Sûra ku hemû kolanên wê



bi gelaşê tijî bûne niştecihên li navçeyê bertek nîşanî qeyûm dan û wiha gotin: "Dibêjin paqijî ji îmanê ye û hikûmet bahsa îmanê dike. Lê ji gelaşa li kolanên me diyar e ku hikûmet tiştekî ji îmanê fam dike. Ji ber gelaşê em nema diwêrin di kolanan re derbas bibin. Em ber dikanên xwe paqij dikin lê ew jî têrê nake. Ev gelaş tenê derdorê qirêj nake wê di dema bê de bibe sedema nexweşiyên giran. Çima kolanên me nayên paqijkirin dewleta bedela çi ji me dixwaze?"…*Amed*

## *Mamosteyên herêma Firatê têne perwerdekirin*

Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk ji bo asta mamosteyan pêş bikeve dest bi perwedekirina mamosteyan kir.
Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk a herêma Firatê xebatên perwedekirina mamosteyên seratayî, navîn û amedehî da destpêkirin. Perwedekirina mamosteyan piştî sala xwendinê ya 2017-2018'an bi dawî bû da destpêkirin.
Di perwedeya ku di peymangehan de tê kirin, mamoste li ser rêbazên fêrkirinê têne perwerdekirin.
Xebatên perwedeyê duh dest pê kir û wê 70 rojan dewam bike. Di perwedeyê de wê herî zêde li ser rêbaza mamosteyan were sekinandin.
Çar hezar û 676 mamosteyên ji herêma Firatê têne perwerdekirin, ji wan 2 hezar û 616 mamoste ji Kobanê ne û 600 ji bajaroka Eyn Îsa ne. Li Eyn Îsa 25 mamoste li ser xebatên perwedekirina mamosteyan disekinin.
Sedema vekirina dewreya mamosteyan ew e ku sîstem û materyalên nû ji mamosteyan re werin zelal kirin. Di perwerdeya mamosteyên seretayî de wê biyolojî, bîrkarî,ziman û pedegojî û mamosteyên beşê navîn wê matryalên, ziman û pedegojî werin dayîn.



Armanc ji perwerdeya mamosteyan, perwerde kirina li ser materyalên nû û rê û rêbazê perwerde dayînê ye.
Di perwerdeya mamosteyên beşa seretayî de wêneyên ziman, biyolojî, pedegojî û bîrkarî, her wiha di perwerdeya mamosteyên beşa navîn de jî dê materyalên, ziman û pedegojî werin dayîn.
Endamê Kordînasyona KPC-D'ê Ridwan Deharo derbarê perwerdeyan de got; "Îsal em ê di perwerdeyê de herî zêde girîngiyê bidin rê û rêbazê mamosteyan. Her wiha em ê giraniyê bidin çand û exlaq, bi vê yekê jî em karibin



pirsgirêkan çareser bikin ji ber ku çand û exlaq bingeha civaka me ye"
Her wiha mamosteya bi navê Îlham Mihemed beşê Kimya ku tevlî perwerdeyê bûye got, "em ji bo perwerdê amade ne, ji ber ku mamost bingehê civakê yê herî serekeye û mamoste nifşên nû ava dike."…*ANHA*



# Zîlanê rê li ber pêvajoyeke nû vekir

***Gêrîlayên jin 22 salvegera çalakiya Zîlanê nirxandin û diyar kirin ku vê çalakiyê rê l ber pêvajoyeke tekoşînê ya nû vekiriye. Gerîlayan got, "Hevrê Zîlan bi çalakiya xwe ya mezin bersiveke mezin da êrîş û siyaseta qirkirinê ya li ser gelê Kurd û Rêber Apo."***

Gerîlayên YJA Starê çalakgera fedayî Zîlan (Zeynep Kinaci) bi bîr anîn û gotin, "Zîlan bi çalakiya xwe ya fedayî re vejîn û berxwedana jinê ji nû ve derxistiye holê."
Ji Fermandarên Biryargeha Navendî ya YJA Starê Emîne Erciyes, ji Fermandarên YJA Starê Eylem Ronî û ji Fermandarên Akademiyên Apollo Zozan Raman, di salvegera 22'an de çalakiya fedayî ya gerîlaya PKK'ê Zîlan (Zeynep Kinaci) nirxandin.

### ZÎLANÊ BERSIV DA KOMPLOGERAN

Emîne Erciyes da xuyakirin ku sala 1996'an ji bo têkoşîna wan pêvajoyeke gelekî girîng bû û got, "Wê wextê Rêberê me agirbest ragihandibû û dixwest ji bo zemînên aştiyê binirxîne. Hewl da rêyên aştî û diyalogê xurtir bike. Armanca sereke ya Rêberê me ew bû ku gelê Kurd, PKK û xeta azadiyê weke mûxatab bê girtin. Dewleta Tirk hewl da pêşî li lêgerînên Rêberê me bigire û bi komployê bersiv da.
Li dijî Rêberê me sûîqest hate kirin. Bombeyeke mezin hate amadekirin. Mirov vê yekê dikare weke prova û gava destpêkê ya komploya navneteweyî jî bibîne. Ji ber ku bi vî rengî bersiv ji niyeta baş a Rêberê me re hate dayin, di nava rêxistinê de hêrseke mezin derkete holê. Lewma hevrê Zîlan jî li ser vê bingehê bû bersiv ji komploya li dijî Rêbertî re."
Erciyes diyar kir ku çalakiya Zîlan hem ji aliyê rêbaza fedayî ve, hem jî rêbaza şer a PKK'ê ve çalakiyeke nû bû û got, "Dijmin wê wextê ji çalakiyeke wiha gelekî tirsiya. Demeke dirêj di rojevê de ma. Ji ber vê yekê çalakiya hevrê Zîlan di dîroka me de rê li ber serdemeke nû, pêvajoyeke nû ya têkoşînê vekir."

### ÇALAKÎ BERSIVEKE MEZIN BÛ



Eylem Ronî jî bal kişand ser qirkirina çandî ya li herêma Zîlan lê mezin bû û bi bîr xist ku kesayet, çand û ziman tê qirkirin. Ronî got, "Hevala Zîlan bi kûrahiya vê nakokiyê hesiya... Nakokî bûn sedem ku bikeve nava lêgerînê û hewl bide fêhm bike. Lewma çalakiya hevala Zîlan her wiha bersiveke ji lîstikên ku dijmin li ser herêma me dilîze.


### HEVALA ZÎLAN

### BAWERIYEKE MEZIN DA JINÊ

Zozan Raman jî işaret bi zext û zordariya li nava civakê li jinê tê kirin û got, "Bi rêya zext û zordariyê hewl tê dayin ku îradeya jinê were şikandin. Hevala Zîlan bi çalakiya xwe baweriyeke mezin da jinê. Hevala Zîlan her wiha nîşanî hemû jinan û mêran da ku ji bo bidestxistina azadî û nirxên xwe yên civakî divê bi çi rengî çalakî were kirin."
Zozan Raman da xuyakirin ku çalakiya Zîlan li dijî sîstema zext û mêtingeriyê hatiye kirin û wiha dewam kir: "Polîtîkayeke giran a înkar û tinekirinê li ser gelê Kurd hatiye ferzkirin. Tinebûn li ser hatiye ferzkirin. Zîlan jî vejîna gel û jinên ku tine tên dîtin, nîşan da. Gelekî girîng û hêja ye ku ya ev rastî afirand, jin e."

## Li Şehbayê têkoşîna jinan xurt e

Endama Rêveberiya Yekîtiya Jina Azad a Kantona Şehbayê Rîhab Çepo rewşa dawî ya li Şehbayê nirxand û got: "Jinên ku li Şehbayê berxwedana xwe didomînin li ser esasên fikir û ramanên Rêber Apo xwe bi rêxistin dikin û dev ji têkoşîna xwe bernadin. Li Şehbayê hêviyên jinan qet winda nabe û sûdê ji têkoşîna bêhempa digirin."
Endama Rêveberiya Yekîtiya Jina Azad a Kantona Şehbayê Rîhab Çepo rewşa dawî ya li Şehbayê nirxand û got: "Piştî ku Şehba ji çeteyên DAÎŞ'ê paqij bû li vir bi pergalek wekhev û alîkar jinan xwe birêxistin kirin. Niha ev rêxistin û alîkarî didome.
Rîhab Çepo wiha dewam kir: "Di nav polîtîkayên qirkirinê de herî bêtir jin û zarok diçewisin. Li Şehbayê jin û zarok tên parastin. Di serdema DAÎŞ'ê de jinan li Şehbayê gelek êş dikişandin. Piştî Şehba ji çeteyên DAÎŞ'ê hat rizgarkirin komîteya jinê hat avakirin û jin hatin perwerdekirin. Niha ev perwerde didome. Ji bo jin bi êrîş û zilmê rû bi rû nemînin perwerdeya xwe dewam dikin."
Rîhabê da zanîn ku jinên Ereb jî hêza xwe ji jinên Kurd digirin û got: "Li Şehbayê ji ber ku jiyanek wekhev heye loma jin ji hev nayên cudakirin. Jinên Ereb jî ji bo xwe bikaribin biparêzin hatin perwedekirin. Niha hemû jinên Şehbayê dest didin hev û têdikoşin."
Endama Rêveberiya Yekîtiya Jina Azad a Kantona Şehbayê Rîhab Çepo wiha dawî li axaftina xwe anî: "Jin ji bo bi êrîşên wekî din rû bi rû nemînin niha xebatên xwe didomînin û dibêjin em nahêlin êdî tu kes zilmê li me bike. Niha jî bi awayekî rêxistinkirî xebatên jinan didome. Em bang dikin ku hemû jin beşdarî xebatan bibin û destûrê nedin ku êdî bên çewisandin."…*JINNEWS*



## JIN TV heyecaneke mezin ava kir



Jinên Dersimî, diyar kirin ku ew di JIN TV'yê de ne weşangeriyeke ku bindestiya hevcinsên wan vedibêje, ew weşaneke ku serketina hevcinsên wan vedibêje dixwazin. Piştî televîzyona jinan JIN TV dest bi weşana xwe kir, heyecanek li jinên dersimî peyda bû. Jinan anî ziman ku ew bawer dikin dê JIN TV tenê ne li Tirkiyê li tevahiya cîhanê bibe dengê jinan. Seda Bûl ku li bajêr esnaf e, diyar kir ku ji ber ku JIN TV bûye dengê jinan wê ev yek bandoreke mezin bide der. Bûl got: "Ji bo ragihandina dengê me jinan, tiştekî girîng e. Loma ji bo me pir taybet e. Divê em jin nûçeyên jinan pêşî ji JIN TV'yê re bişînin. Bi ya min dê tekane kanal be ku jin bi awayekî rihet xwe bînin ziman." Xebatkara kafeyê Nazlican Gul, anî ziman ku bi vekirina JIN TV'yê heyeceneke mezin li wan peyda bûye û ji bo dengê jinan bilintir bibe tiştekî girîng e. Gul, destnîşan kir ku ew dixwazin di ekranên JIN TV'yê de belgefîlmên derbarê jinan, bernameyên derbarê jinên ku pêşengya civakê dikin bên çêkirin. Gul got: "Bi ya min dê JIN TV dengekî mezin bide."
Xwendekar Zîlan Gulayatay, diyar kir ku di serdemeke ku jin tên qetilkirin û li ser jinan çewisandin zêde hene de vekirina JIN TV'yê watedar e û got: "Ji bo kesên ku jinan tune dihesibînin bersiveke baş e." Fatîma Guneş jî, diyar kir ku ji ber JIN TV vebûye ew kêfxweş e û her wiha ji ber ku kanal pirzimaniyê, pirçandiyê esas digire ew bêtir kêfxwe bûye. Guneş got: "Dê jin bi rihetî xwe bînin ziman. Dixwazim weşangeriyeke li gorî rolên zayenda civakiyî bike. Wisa bawer dikim ku dê tesîreke erênî bide der."

Rêxistina Kongreya Star a navçeya Şêran a Kantona Kobanê navenda xwe bi merasîmekê vekir.
Rêxistina Kongreya Star a navçeya Şêran a Kanotna Kobanê bi merasîmekê navenda xwe li navçeyê vekir. Bi sedan şêniyên navçeyê û endam û rêveberên Kongereya Star di merasîma vekirinê de amade bûn.
Piştî deqeyek rêzgirtin li ser giyanên şehîdan, axaftin ji aliyê endamê û rêveberên Kongra Star ve hatin kirin. Her wiha di merasîma vekirina navendê de axaftin hatin kirin.
Kesên axivîne vekirina navenda Kongreya Star li Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û cangoriyên azadiyê pîroz kirin.
Di axaftinan de armanca vekirina navendê hate destnîşankirin û hat gotin ku cihê rêxistinkirina jinan û çareserkirina pirsgirêkên wan e.
Jinên ku axivîn ji jinên navçeyê xwestin ku bi berpirsyariya xwe ya li hemberî navendê rabin û bibin şopdarên xeta şehîd Zîlan.
Deriyê navendê bi destê dayikên şehîdan ên Şêranê hat vekirin.
Her wiha şano ji aliyê navenda çand û hûnera navçeya Şêranê ve bi navê "desthilatdariya li ser jinê" hate pêşkêş kirin.
Merasîma vekirinê bi gerandina xelekên dîlanê bi dawî bû…*ANHA*

## Navenda Kongra Star li navçeya Şêranê hat vekirin



## Dewleta Tirk li Başûrê Kurdistanê jinek kuşt



Di encama topbarana dewleta Tirk a dagirker a li Başûrê Kurdistanê de jineke ciwan jiyana xwe ji dest da.
Hêzên dewleta Tirk a dagirker, bi topan êrîşî herêma Barzan a Başûrê Kurdistanê kir.
Li gorê nûçeya ajansa Rojnewsê, roja 30'yê Hezîranê saet derdora 15.30'î êrîşek pêk hat û di êrîşê de jineke 19 salî jiyana xwe ji dest da.
Herêma hatî topbarankirin, bajaroka Şêrwana Mezin a girêdayî navçeya Mergesor ya Hewlêrê ku dikeve herêma Barzan e.
Hate ragihandin ku jina ciwan a jiyana xwe ji dest dayî, ji gundê Bawra ye û navê wê Dînyar Reşîd Nacî ye. Termê Nacî, rakirin Tipa Edlî ya Soranê.
Ev bi mehan e ku dewleta Tirk a dagirker êrîşî herêma Başûrê Kurdistanê dike. Herêmên sivîlan bi awayekî sîstematîk tê bombekirin. Beriya niha bombeyên misketan ku çekeke hatiye qedexekirine jî bikar anîbû. Di van êrîşên dewleta Tirk a dagirker de herî zêde sivîl zererê dibînin. Heta niha bi dehan sivîl ji ber topbaranê jiyana xwe ji dest dane.

# Em ê xeyalên Şêx Seîd pêk bînin

***Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê, Şêx Seîd û 49 hevalên wî yên 93 sal beriya niha li Amedê ji aliyê dewleta Tirk ve hatin îdamkirin bi bîr anî û diyar kir ku wê xewn û xeyalên wan bi cih bînin.***




Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê, Şêx Seîd û 49 hevalên wî yên 93 sal beriya niha li Amedê ji aliyê dewleta Tirk ve hatin îdamkirin bi bîr anî û diyar kir ku wê xewn û xeyalên wan bi cih bînin.Di daxuyaniya KCK'ê de ji bo Zîlan ku 30'ê Hezîrana 1996'an li Dersimê li dijî artêşa Tirk a dagirker çalakiya fedayî kir, wiha hate gotin: "Di salvegera îsal a şehadeta wê de ku dijmin bi çavsorî êrîş dike, ji bo mirov bibin xwedî pratîka serketî, gelekî girîng e ku jiyan û felsefeya têkoşînê ya Şehîd Zîlan fêhm bikin. Felsefeya jiyan û têkoşînê ya Şehîd Zîlan wê teqez me bi ser bixîne û bigihîne Kurdistana Azad, Rêberê Azad."

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê got, "Kurdistana Azad xewn û xeyala Şêx Seîd û hevalên wî bû. Em soza xwe dubare dikin ku em ê xewn û xeyalên wan pêk bînin."

Daxuyaniya Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê wiha ye: "Di salvegera 93'an a darvekirinê de em Şêx Seîd û 49 hevalên wî bi minetdarî û rêzdarî bi bîr tînin. Em soza xwe dubare dikin, em ê Kurdistanê azad bikin ku xewn û xeyala wan bû. Em hevrê Zîlan jî bi minetdarî û rêzdarî bi bîr tînin ku 30'ê Hezîrana 1996'an çalakiya fedayî kir û bi vî rengî pîvana fedayîtiyê ya têkoşîna azadiyê ya Kurdistanê û dilsoziya bi nirxan bilind kir. Em ê di xeta wê ya fedayî û dilsoziya bi Rêber Apo re têkoşînê geş bikin û careke din destnîşan dikin ku em ê Kurdistana Azad, Tirkiyeya Demokratîk û Rojhilata Navîn a demokratîk biafirînin.

Darvekirina Şêx Seîd û hevalên wî li Sûrê, ji bo berxwedêrên xwerêveberiyê yên zivistana 201-2015'an bû nirxê herî mezin ê moralê. Şehîd Çiyager û hevrêyên wî, di her kêliya berxwedanê de anîn bîra xwe ku Şêx Seîd û hevalên wî li sêgarê jî Kurdistana Azad anîn ziman. Heta nefesa dawî bi hesreta wan a ji bo Kurdistana Azad li ber xwe dan. Fermandarê mezin Çiyager bi vê hesretê got, 'encama vê têkoşînê wê bêhempa be' û di nefesa xwe ya dawî de ji bo Kurdistana Azad mizgînî da.

Şêx Seîd û hevalên wî, li dijî polîtîkayên mêtinger qirker bûn wijdan, exlaq, hesret û temsîla Kurdan. Eger ew wê wextê li ber mêtingeriya qirker ranebûna, ew berdêl nedabûna, wê têkoşîna azadî û demokrasiyê derneketibûya holê. Kêmasiyên xwe yên rêxistinî û rêbertî çi dibe bila bibe, ji aliyê dîrokî ve xwedî roleke bi vî rengî ya mezin bûn. Hezar carî heq kirine ku bibin pêşiyên bi rûmet ên Kurdan. Şêx Seîd, Îhsan Nûrî Paşa û Pîr Seyîd Riza, weke pêşiyên bi rûmet ên Kurdan nîşan dan ku divê helwesta Kurdan çawa be. Gelê Kurd gelekî deyndarê wan e. Zarokên wan jî wê bibin xwedî sekna wan a bi rûmet û xewn û xeyalên wan teqez pêk bînin.

**'ŞEHÎD ZÎLAN DI DEMÊN ZEHMET DE BÛYE RÊBEREK'**

Hevrê Şehîd Zeynep Kinaci jî nîşan da ku di dema herî zehmet de divê helwesteke çawa bê nîşandan û mîna berxwedêrên 14'ê Tîrmehê, rêbaza şoreşa Kurdistanê raxist pêş çavên gel û hevrêyên xwe. Lewma divê Şehîd Zîlan weke rêbera demên herî zehmet bê dîtin û rêbaza wê ya têkoşînê li her qadê bi cih were anÎn.

Şehîd Zîlan, weke sembola dilsoziya bi Rêbertî û pêngava demên herî zehmet, yek ji nirxên bingehîn ên têkoşîna me ye. Hevrê Zîlan felsefeya jiyan û têkoşînê ya Rêber Apo herî baş watedar kir û li ser vê bingehê pratîkeke serketî nîşan da. Di salvegera îsal a şehadeta wê de ku dijmin bi çavsorî êrîş dike, ji bo mirov bibin xwedî pratîka serketî, gelekî girîng e ku jiyan û felsefeya têkoşînê ya Şehîd Zîlan fêhm bikin. Felsefeya jiyan û têkoşînê ya Şehîd Zîlan wê teqez me bi ser bixîne û bigihîne Kurdistana Azad, Rêberê Azad.

Em bang li hemû hevrê, şervan û gelê xwe dikin ku li ser xeta têkoşînê, hesret û hestên Şêx Seîd, 49 hevalên wî yên şehîd û Şehîd Zîlan têkoşînê geş bikin, Kurdistanê azad bikin û Tirkiye û Rojhilata Navîn demokratîk bikin."



## Li Deraayê bêdengî serwer e

Piştî ku Rûsya û komên çekdar ên li başûrê Sûriyê danûstandin kirin, li Deraayê bêdengî serwer e. Li Deraayê di rojên dawîn de bi sedan welatiyên sivîl ji ber bombebarana hêzên rêjîmê jiyana xwe ji dest dan. Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê li ser navê çavkaniyên pêbawer ku navbênkariyê di navbera hêzên Rûsya û nûnerên parêzgeha Deraayê de dikin, ragihand ku danûstandin tevî hemû astengiyan, derbarê çarenûsa bajarokên li gundewarên rojhilatê Deraayê de hê jî nehatine rawestandin, di heman demê de danûstandin der barê giştî parêzgeha Deraayê de tên domandin ku peydakirina çareseriyeke aştiyane ya di navbera her du aliyan de armanc dike.Di dema çalakiyên danûstandinê de li ser daxwaza Rûsyayê bêdengiyek li giştî parêzgeha Deraayê serwer e. Nemaze piştî êrîşeke dijwar a bi fûze û topavêj û êrîşên ezmanî yên hêzên rêjîmê û hêzên alîgiriya wê dikin li dijî bajarê Deraa û gundewarên wê ku di encamê de komkujiyek li dijî welatiyên sivîl pêk hat û tê de herî kêm 10 welatiyên sivîl bûn qurbanî û bêtirî nîvê wan zarok bûn û gelek kesên din jî birîndar bûn.Toreya SkyNews xwe spart çavkaniyên tenduristî yên li Deraayê û diyar kir ku di encama êrîşa ezmanî û fûzeyan a rêjîmê û hêzên Rûsyayê li dijî Deraa de 60 welatiyên sivîl di van 24 saetên dawîn de jiyana xwe ji dest daye.

Hêzên rêjîmê di 19'ê Hezîranê de çalakiyeke leşkerî li dijî komên çekdar ên li parêzgeha Deraayê da destpêkirin û piştî danûstandinên di navbera Rûsya û komên çekdar de karibû gelek bajarokên parêzgeha Deraa bi dest xwe ve bîne.Hin raporan diyar kir ku şêwirên di navbera Rûsya, Îran, Amerîka û Îsraîlê de pêk tên û di encamê de hêzên Îranê ji sînorên bi Îsraîlê re dûr ketin û hêzên rêjîmê derbasî şûna wan bûn.

## Divê destûra Sûriyê li gor daxwazên gel be

Hevserokê Meclîsa Sûriya Demokratîk (Buroya Helebê) Merei Şiblî anî ziman ku divê destûra Sûriyê mafê hemû pêkhateyên Sûriyê bê ku cûdahî têxe navberê wan, bide.

Hevserokê MSD`ê yê buroya Helebê Merei Şiblî pêvajoya ku Sûriye tê re derbas dibe û nîqaşên guhertina destûrê Sûriyê nirxand. Şiblî destpêka axaftina xwe de bal kişand li ser aloziya Sûriyê û wiha got:″Aloziya Sûriyê ku 8 salan berdewam dike û ji ber nehat careser kirin gelê me yê Sûrî bi hemû pêkhateyên xwe bi milyonan neçarî koçberiyê bûn û gelek kes di avê de xeniqîn û mirin″.



Mereî çareserkirina aloziya Sûriyê û guhertin destûrê Sûriyê wiha nirxand: ″Cinêv û Astana yên di bin navê çareserkirina aloziya Sûriyê de dihatin lidarxistin, negihîştin tu encamê û tiştek nedan gelê Sûriyê. Em gelên Sûriyê pêdiviya me bi destûrekî ku me hemûyan li welatekî kom bike û maf û azadiya me misoger bike heye. Niha Sûriye ji bo dewletên derve bûye lîstgeh û di encama kêmasiyên me de me xwîn rijand lê belê hîna hêza me heye ku em civaka xwe rakin ser lingan. Divê danûstandin bi hemû aliyan ve were kirin û nema destûr ji hêzên derve re were dayîn ku destwerdana Sûriyê bikin″.

Şiblî di dawiya gotinên xwe de wiha got: ″Em weke gelên Sûriyê dozger û parêzerên me hene dikarin destûrê biguherînin û em destewerdana derve naxwazin. Daxwa û hêviyên gelên Sûriyê ji destûra nû heye″…*ANHA*



## Di êrîşa dewlat Tirk ya li ser başûr de hedef Îran e

Ezîz KOYLUOGLU

Dîktatoriya Erdogan ya faşîst êrîşên xwe li ser Kurdan dijwar kiriye. Ne tenê li bakurê Kurdistanê, rojava û başûr jî kiriye hedefa xwe. Li başûrê Kurdistanê bi taybet li herêma Kêlaşîn, Xakurk, Xinêre û Qendîl ya li ser sînorê Îranê dixwaze dagirkeriya li seranserî sînorê Îranê berfireh bike. Di ragihandinan de derket ku dewleta tirk ev çend sale bi hezaran çeteyên li Sûriyê xwedî dike dixwaze, li başûrê Kurdistanê bihcih bike. Ev, ji ber li ser erdnîgariya başûrê Kurdistan e, metirsiyek mezin ji bo Kurdan e. Deshilatiya başûrê Kurdistanê heta niha li ser dagirkeriya dewleta Tirk li ser herêmên Xakurk û Xênere helwestek nîşan nedaye. Berovajî wê him serokê hikumeta herêma Kurdistan, him rêveberiya PDK'ê yên wek Sefîn Dizeyî ji bo dagirkeriya dewleta Tirk ya faşîst rewa nîşan bidin çi ji destê wan tê dikin. Ev her dû kesên di nava PDK'ê de tu tiştekî wan bi Kurdayetî nîne. Him Niçîrvan Berzanî û Sefîn Dizeyî bi salane bi dewleta Tirk re di nava hevkariyên aborî û siyasî di asta herî bilinde ne. Lê niha bi rêya PDK'ê li çiyayê başûrê Kurdistanê yên asê amadekariya DAIŞ'ek nû dike. Ev amadekariya dewleta Tirk ya dagirkeriyê tê wateya alîkariya DAIŞ. Niha li vir pirsek heye, ger li ser navê dijberiya tevgera azadiya gelê Kurd, PDK dixwaze DAIŞ li vê herêmê bicih bikin, ev wê çiqas di berjevendiyê wan de be? Niha dîsa rêveberiya PDK'ê çawa dema DAIŞ Musil dagir kir digot, "ew şoreşgerin, ew ne li dijî min in, li dijî Malîkîne" niha jî bi ser navê dijberiya tevgera azadiya gelê Kurd dixwaze, DAIŞ'ê li çiyayan bi rêya Dewleta Tirk bi cih bike. Pirs ev e ku li şûna tevgera azadiya gelê Kurd, li çiyayên başûrê Kurdistanê bi cih kirina DAIŞ wê çiqas di berjewendiyê gelê Kurd de be. Ji xwe hebûna leşkerên Tirk li başûrê Kurdistan wek metirsiyek mezin li ser hebûna gelê Kurd e. Niha jî bi cih kirina çeteyên DAIŞ yê girêdayî dewleta Tirk li çiyayên başûrê Kurdistanê destpêkê li ser gelê Kurd wê metirsiyên wek komkujiyên Şengalê çêbike. Ev di asta herî zêde wê li ser PDK'ê metirsî be. Dagirkeriya dewleta Tirk li ser başûrê Kurdistanê û bi cih kirina çeteyên DAIŞ'ê li vir, piştî ku Emerika siyaseta xwe li hemberî Îranê guhert û ji peymana atomî xwe vekişand, ket rojevê. Ev hemleya dewleta Tirk ya dagirker, tê dîtin ku li gora siyaseta Emerika ya dijberiya Îranê wek amadekariye. Dewleta Tirk bi vê hamlê dixwaze ev herêma aram ku bi agirbesta di navbera dewleta Îran û tevgera azadiya gelê Kurd de pêk tê ji nav bibe. Û vê herêmê him li dijî hikumeta merkezî ya Iraq him jî li dijî Îranê bike herêmek êrîşê.Dewleta Tirk armanc dike, bi rêya çeteyên xwe yên DAIŞ, li çiyayên Kurdistanê heta başûrê Bexdayê, derbasî herêma Xûzîstan ya pirraniya wê Erebên sûnî ne, bibe. Dîsa li ser xakurk û Qendîlê ve li ser çiyayên rojhilatê Kurdistanê derbasî çiyayên Elbûrz bibe û di bakurê Îranê re derbasî Efganîstanê bibe û bi rêya çeteyên xwe yên DAIŞ'ê wek hîlalekê Îranê dorpêç bike.Yek sedemek êrîşkariya dewleta Tirk ya li ser Kurdan jî, di rewşek destwerdana li ser Îranê de Kurdan wek hêzek careserî û demokratîk bê bandor bike. Dewleta Tirk naxwaze weke li Sûriyê ku Kurdan wek xeta sêyemîn xwe bi rêxistin kirin û ji bo demokratîk kirina Sûriyê xebatkir û dîsa siyaseta dewleta Tirk ya li ser Sûriyê pûçkir, di rewşek wiha de li Îranê jî ev yek wê dubare bibe. Ji bo wê him li rojava him jî li başûrê Kurdistanê êrîşî tevgera azadiya gelê Kurd dike.



# Binpêkirin li Efrînê di asta jor de ne

**Komîseriya Bilind a Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî derbarê rewşa mafên mirovan li Sûriyê de raporek weşand. Di raporê bal hat kişand ser binpêkirinên mafên mirovan ên di meha Hezîranê de li bakurê Sûrî û bi taybetî li Efrînê pêk hatiye û got, "binpêkirin di asta herî jor de ne."**



Komîseriya Bilind a Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî derbarê rewşa mafên mirovan li Sûriyê de raporek weşand. Di raporê de tê gotin ku binpêkirin û destdirêjî li herêmên di bin dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê de di asta herî jor de ne.

Komîseriya Bilind a Mafên Mirovan a Neteweyên Yekûbyî têkildarî rewşa mafên mirovan li Sûriyê raporeke weşand. Di raporê bal hat kişand ser binpêkirinên mafên mirovan ên di meha Hezîranê de li bakurê Sûrî û bi taybetî li Efrînê pêk hatiye. Komîseriyê di raporê de destnîşan kir ku herêmên di bin dagirkeriya dewleta Tirk de rastî gelek binpêkirinan tên û got ku binpêkirin û destdirêjî li herêmên di bin dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê de di asta herî jor de ne.

Li gorî raporên ku ketine destê komîseriyê, piraniya çeteyên Tirkiyê di bingeh de diz, qaçaxcî û bazirganên narkotîkê ne.

Di raporê hat destnîşan kirin ku rojane raporên binpêkirinan ji herêmên mîna Ezaz, Bab û Cerebluse tên, lê yên herî zêde jî ji Efrînê derbarê desteserkirina malên welatiyan de ne.

Di raporê de tê gotin ku çete û malbatên wan ên ji Idlib, Xûtaya Rojhilat, gundewarên Humsê û Hemayê hatine destdanîne ser malên şêniyên Efrînê û dema şênî vedigerin jî malên wan nadin wan.

Di derbarê çûn û hatina sivîlan de jî di raporê de hate gotin ku bi navê "qadên ewlehî" de, ji aliyê Ceyş El-Îslam û Feyleq El-Rehman ve Efrîn hatiye dabeşkirin, lewre heyanî ku sivîl ji kolanekê biçin ya din divê destûrê ji noqteyên kontrolê yên artêşa Tirk bigrin.

Dîsa, bi bihaneya endamên YPG-YPJ ne, li ser noqteyên kontrolê jinan binçav dikin û heya niha cihê piraniya kesên hatine binçavkirin ne diyar e.

Her wiha di raporê de hate diyarkirin ku rojnamevan û çalakvan jî rastî êrîş û êşkenceyên hovane yên çeteyan tên.

Komîseriyê teqez kir ku divê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê rêz ji pîvanên mafên mirovan ên navnetewî re bigrin û wan bin pê nekin.

## Li dijî dagirkeriyê bêdeng nemînin



Rojnamegerên bajarê Helebce diyar kirin ku bêdengiya li hemberî dagirkeriyê nayê qebûlkirin û daxwaz ji gel û aliyên siyasî dikin dijî dagirkeriyê helwestên cidî nişan bidin.

Bêdengiya hikûmeta Herêma Kurdistanê û Iraqê li hemberî dagirkeriya dewleta Tirk nerazîbûna welatî û pêkhateyên Başûrê Kurdistanê zêde kiriye. Rojnamegerên bajarê Helebce, nerazîbûn nîşanî bêdengiya li hemberî dagirkeriya dewleta Tirk dan.

Yek ji rojnamegerên bajarê Helebce Çoman Osman diyar kir ku dagirkeriya dewleta Tirk li ser xaka Başûr, berpirsiyartiya parlamento, hikûmet û aliyên siyasî dixe gumanê û wiha got; "Bêdengiya wan li hemberî hemberî vê dagirkeriyê xiyanetek niştîmanî netewî ye. Nabe ji vê zêdetir bêdeng bibin. Pêwîste dijî dagirkeriyê gavên cidî bên avêtin." Osman her wiha rexne li PDK'ê kir û got; "PDK ji bo berjewendiyê hizbî û desthilatî û dagirkirina qadên siyasî û aborî, bûye alikarek baş ê dewleta Tirk û anîna leşkerên Tirk. Divê tevahî komên parlamentoyê zextê li ser hikûmeta herêmê û Iraqê bikin ku pêşî li hêzên dewleta Tirk bigirin."

Rojnamegerek din a Helebce bi navê Kelsum Hisên jî li ser heman mijarê wiha axivî; "Tirkiyê li ser dagirkeriya xwe PDK û PDK'ê jî aliyên din bêdeng kirine."

Hisên her wiha daxuyakirin ku netifaqiya aliyên siyasî sedema nebûna helwestek giştiye û axaftina xwe wiha bi dawî kir; "Ji ber nebûna tifaqa aliyên siyasî, nekarîne helwestek giştî dijî dagirkeriya dewleta Tirk bê nişandan. Baweriya min bi îradeya gel heye ku dijî bêdengiya aliyên siyasî derkevin û qebûl nekin."…*ROJNEWS*

## Em ê Efrînê rizgar bikin, dagirkeriyê têk bibin



Bi hezaran welatiyên Efrîn û Şehbayê li dijî binpêkirinên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê yên li Efrînê, bi dirûşmeya "Jin ji bo Efrînê serî hildin" daketin qadan.

Meşa pêkhateyên Efrîn û Şehbayê ji Kurd, Ereb û Suryan bi pêşengtiya Kongreya Star her wiha ji bo bîranîna têkoşer Zeyeb Kinaci (Zîlan) di salvegera şehadeta wê de bi dirûşmeyan hate destpêkirin. Meş ji stada Til Şeîr a navçeya Fafîn ber bi gundê Babnisê ve destpê kir.

Di meşê de, alên Kongreya Star, TEV-DEM, wêneyên têkoşer Zîlan, pankartên bi nivîsên "Hûn qirîna jinên Efrînê nabhîzn, ji guhertina demografî re na, ji paqijiya etnîkî re na, Erdogan kujerê jinan e û bi rihê Zîlan, Avesta û Arînan em ê Efrîn rizgar bikin" hatin hildan.

Meş li gundê Babinsê veguherî mîtîngê, li vir bi navê Koordînasyona Kongreya Star Zîlan Xebat axivî û wiha got, "Em şagirtên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û şopdarên felsefeya Neteweya Demokratîk in. Bi sedan jin ji bo belavkirina fikrê wî çalakiyên fedayî kirin. Em soza şopandina xeta cangoriyên azadiyê didin."

Endama Kongreya Star a Şehbayê Rîhab Hebo jî binpêkirinên leşker û çeteyên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî jinên Efrînê şermezar kir û diyar kir ku jinên Şehbayê bi hemû pêkhateyên wê beşdarî pêngava Kongreya Star a ji bo piştgiriya Efrînê bûne. Rîhab got, "Bi rihê Zîlan, Barîn û Avestan em ê dagirkeriyê têk bibin û Efrînê rizgar bikin."

## Asayîşê têkildarî teqîna li Hesekê daxuyanî da



Fermandariya Asayîşa Giştî ya Rojava-Bakurê Sûriyê têkildarî teqîna li Hesekê ku 7 kes birîndar bûbûn, daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Di daxuyaniyê de hate gotin ku êrîş li dijî navendeke Hêzên Sotoro yên dibin banê Hêzên Asayîşê de pêk hat û di êrîşê de 7 kes birîndar bûne.

Daxuyanî wiha ye;

"Roja 30'ê Hezîranê saet derdora 21:40'an li dijî yekji navendên Hêzên Sotoro yên di bin banê hêzên me de ku li nêzî dibistana El-Xesaniye êrîşek pêk hat. Di encama êrîşê de 7 kes birîndar bûn.

Hewldanên bi vî rengî ku terorist pêk tînin, nîşana herî berbiçav e ku dawiya terorîstan hatiye. Em ê tu carî têkoşîna xwe ya ji bo azadiya hemû herêmên Bakurê Sûriyê ranewestînin."



## Kela Ewrupayê ji Erdogan re ma

Bûrhan ERDEM

Li Brukselê yek ji zîrveyên dîrokî yên Yekitiya Ewrupayê di rojevê de bû. Tiêta di sere me kurdan de ma ya ji vê civîna lîderên welatên ewrupî ew bû ku careke din pere dan rejîma Tirk a dictator û di ser de jî Şansolyeya Almanyayê Angela Merkel sipasî Tirkan kir. Lewara dîrokîbûna vê lutkeyê, ji ber mijara pênaberan bû.

Krîza koçberan a li Ewrupayê di meha dawî de veguhezîbû koregirêkekê. Keêtiyên bi mirovên muhtacî alîkariyê tijebûn, ji hemû welatên deryayê yên Ewropayê hatibûn qewitandin. Di nava hukumetan de polemîkên giran hatibûn jiyîn. Pêşniyarên li ser awayê paşdeşandina pênaberan di devê polîtîsyenên rastgir ên hemû welatan de bûn û hedefa wan jî polîtîkayên yekitiyê bû.

Di encamê de jî lîderên Ewrûpî gotin riya li pêşiya hatina Ewropayê ya pênaberan ewê ji niha û pêve bêtir were astengkirin. Di nava biryarên rayedarên ewrupî de herwiha danûstendineke xurt a bi welatên cîhana sêwemîn re jî heye.Bi taybetî, ew welatên xwediyên ketin û derketina pir a koçberan hedefa rayedarên Ewrupî ne ku tê xwestin ev welatên han bêtir sînorên xwe biparêzin û ji bo kontrola sînoran ewê Ewrupa Alîkariya wan bike.

Hewldana herî mezin a di vê çarçoveyû de jî, avakirina kampên li derveyî axa Ewropayê ye. Weke Tirkiyeyê dixwazin li welatekî Afrîkaya Bakur weke Fas û Tûnisê navendeke wergirtin an jî paêdeşandina koçberan ava bikin. Dîsa di nava van tedbîran de vegera, pênaberan jî mijareke din e ku tê xwestin ji bo pênaberan li welatên wan vegerînin mekanîzmayeka xurt biafirînin. Ewê bi welatên din re li ser dayina agahiyan û kontrolkirina belgeyan hhevpeyman werin çêkirin û ewê hertim bi van welatan re di nava hevkariyê de bin.

Lîderên YE'yê dixwazin ji bo van tedbîran pêk bînin butçeyekê jî ava bikin. Tirkiye piştî wergiritna 3 milyar Euroyî, wê pareke din jî ji vê butçeyê bigre. Lewra xweş di bîran de ye ku çawa bi dirêjbûna şerê navxweyî yê Sûriyeyê re, bi milyonan koçber ji ser Tirkiyeyê dan ser rêya YEyê û vî tiştî têkiliyên Tirkiye û YEyê tengijandibû. Niha jî ev mijar çekeke bi tesîr a di destê rejîma Erdogan de ye.Li nava YEyê kesên ji vê polîtîkayê nerazî, gelek in û dayina van pereyên ji bo Erdoganê şantajê li wan dike, gelekî bi wan zor tê. Lê dest mecbûr e. Lewra Almanyayê ev yek qebûl kiriye. Di meha borî de Wezîrê Karê Hundur ê hevparê hukumeta Merkel ê ji Baviyerayê Horst Seehofer, gotibû ew du hefteyan wext dide Merkelê ku çareseriyekê jib o şandina pênaberan bibîne. Çareseriya wê dêt jîm tevî paêdeêandina koçberan a Yunanîstanê bû. Yunanîstana muhtacî alîkariya Almanyayê ye jîji mecbûrî qebûl kiribû. Bi wî şertî ku rê li pêşiya derbasbûna ji Tirkiyeyê were dîtin. Çareseriya vê yekê jî naskirina dîktatoriya Erdogan bû ku Merkel her jê re hazir e. Jixwe Merkel di sala 2016'an de gelek caran çûbû Tirkiyeyê û desteka xwe ji Erdogan re eşkere kiribû. YEyê weke hercar çavên xwe li bêhiqûqiya li Tirkiyeyê, pêkutiya li ser Kurdan û girtina kesên mûxalîf girtibû û bi vî awayî di navbera Tirkiye û YE'yê protokola penaberan hatibû îmzekirin. Erdoganê bû xwediyê vê rewadîtina Ewropiyan, wê êdî zulma xwe her zêdetir bike.